

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



19

19

19

19

19

19

19

www.arsivakurdi.org



ZAROK FÊKIYÊN MALAN E

HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND


CÎROK Û MESELÊN XWE

Jİ WERE BÊJEN

KULÎLK

KÊZ XATUN U MİŞKO

Di bê kêzikek he bu. Kêzikê dixwest bi zewici.
Ji bo yekî ji xwere bibîne,kêzik ket ser rîya.



Kêzik li gavanekî rast hat. Gavan ji kêzê re got:

-Kêzê ! Ma tu li çi digeri ?

Kêzik bi gotina gavan gelekî aciz bu û bi hêrs li gavan vegerand:

-Ne bê kêzê ! Bêje Kêzê kêz xatûnê,bi şimik a req reqûnê,bi kirasê trabzonê,tu li çi digeri ?

Gavan bi awayê ku kêzikê ji re got pirsî.Kêzikê lê vegerand :

-Ez dixwazim bi zewicim û ji xwere li mîrekî di gerim.

-Ma tu mi naki?

-Belê,lê şertekî min heye.Ez dixwazim fêm bi-kim,ku tê bi çi li mixi.

-Ezê bi darê gavanî ye li texim.

-We çaxê ez te nakim.

Kêzikê rîya xwe dom kir û qederkî çu.Kêzê ve carê li şivanekî rast tê.Şivan ji kêzê dipirsi:

-Kêzê! Ma tu li çi digeri?

Kêzê carek din aciz bu û li şivan vegerand:

-Ne bê kêzê! Bêje kêzê kêz xatûnê,bi şimika req reqûnê,bi kirâsê tırabzonê,tu li çi digeri?

Şivan jî bi wî awayî ji kêzikê pirsî û kêzikê li şivan vegerand :

-Ez ji xwere li mîrekî digerim.

-Ma tu mi nake?



-Belê,çima ez te nakim.Lê şertekî min heye,ez dixwazim zanibim,ku tê bi çi li mixi.

-Ezê bi darê şivantîyê li texim.

-We çaxê ez te nakim.



Kêzê disa ket rê û piştî qederkî li mişkekî rast tê. Mişk meraq diki û ji kêzê dipirsi:

-Ha kêzê! Ma te xêre, tu bi kude dici?

Kêzê dîsa qeherî, wek ku ji gavan û şivan re gotibu li mişk jî vegerand:

-Ne bê kêzê! Bêje kêzê kêz xatûnê, bi şimika req reqûnê, bi kirâsê tirabzonê, tu li çi digeri?

Mişk, bi wi awayî ji kêzê pirsî. Kêzê li mişk vedigerine:

-ez ji xwere li mîrekî digerim.

-Ma tu mi naki?

-Ma çîma ez te nakim. Lî şertekî min heye. ez dixwazim zanibim, ku tê bi çi li mixi.

-Ezê bi terîya xwe li texim.

-Gelek başe, we çaxê ezê te bikim.



Kêzê û mişko bi hevdu re zewicîn.Ew çûn ser cemekî,da ku kincên xwe bişon.Mişko ji kêzê re got :

-Kêz xatûn,dawetek li wi gundê nêzîk heye,he- ta ku tu kinca bişo,ezê jî herim dawetê.Da ku ez tiştekî buxum û hinek xwarin ji te re jî bînim.

Mişko berê xwe da wî gundê dawet lêye.Di we nabênenê de gava kêz xatûn kincan dişo,di avê wer- dibi.



Suwarek di wê derêde derbas dibi.Kêzê,dema ku suwar dibîni ba wî suwarî diki û dibêje :

-Lo lo suwaro suwar beleko,şasik şîno eba beleko,tê here dawetê mala Heynder.Bêjê mişko mişkelîyo,hestî kojo gowendçîyo,kêz xatûn di avê werbûye.

Suwar di here nav dawetê û wê hedîsa xwe ji der-dora xwe re dibêje.Mişko li wan nêzikaye û deng diçe wi. Mişko hestîya davê û berê xwe didi cem û bi bazdan deheri ser avê.





Ji kêzê re dibêje :

-Terîka min bigre, ezê te ji avê derxînim. Gava
ku mişko terîya xwe dirêjî kêz xatûn diki, mişko
jî nigê wi dişemiti û dikevi avê cem Kêz Xatûn ê.

Cîroka me li dîyara, rahmet li dê û bavê guhda-
ra.

Berevkar : PIRO

QUNCİKA DÜRIKÊN ZAROKAN

Gava em zarok bûn û me dilîst, ji bo na ku em hevdû bijmêrin, me ev dûrikana digotin.

Zarokên me gava derketin dervî welêt jî, ew dûrikê xwe digotin. Lê mixabin her deheri ew têr ji bîrkirin.

Ji bo vê yekê, me xwast em quncikek wan dûrika çêkin.

Em hêvîdarin, ku xwendevanên me ewe vê Quncika Dûrikêن Zarokan zengîn bikin.

KULÎLK

0

-1-

Ho kildo mo kildo

Kil ji kilê buharê

Av ji ava çinarê

Qîza elo beraze

Yekî ereb dixwaze

Miîna ereb derxîne

Zeng û zîn a bi serxîne

Çel qeytanê zêrînî

Hirç elimî ser texta

Çav bi nayê bi rexta

Girê Hopanê panê

Tije sar û sermane

Pezê sor û talane.

-2-

Yek di do
Bawer sisê
Ahmê Hisê
Çeqla fisê
Mamo dîno
Şekrê şîno
Ew neqebê
Li ber te bê
Tê wer ne bê.

-3-

Sat axa satil axa
Qûn axa qantir axa
Hilisi milisi çar ti li sî
Ar tütuk berwar tütuk
Şêx gêlanê dev rûtik.

-4-

Rêvî rêvî rindik
Serê dêlê qurfindik
Rêvî çû serê cara
Xwariye terxê hespê sara
Bijmêr, bijmêr heg ne bîst û cara
Qetla rêvî helala.

QUNCUK A PÊZANÎN ^

Pirs : 1

Çel û çar û çarde,bîst û bênc û banzde,hivdak û
du hîjde gelo diki çu qasî ?

Bersîv:

Pirs : 2

Kumê hûtuk tije,nûtuk çî ye?

Bersîv:

Pirs : 3

Tenûra xim ximî,tije nanê genimî,çî ye?

Bersîv:

Pirs : 4

Ji bivir girantir e,ji şekir şêrintir e,çî ye?

Bersîv:

Pirs : 5

Hilindir milindir kur ji bavê bilintir,çî ye?

Bersiv:

Pirs : 6

Li vira go xişt,li wira go xişt,li derê han
kulê lê da kuşt. çî ye?

Bersîv:

D Ü R I K

B A R A N E

Baran barî bi nîmeta

Rûkê erdê kir xeta

Ramîsanê keçika

Li mala bavê adeta

Li mala mîrik qebheta!!...

Were lê lê baranê

Baran barî bi zembîla

Rûkê erdê kir bîra

Ramîsanê keçika

Xwesin li malê d'wezîra

Hewar lê lê baranê!!...

Ka sozê bin eyvanê

Ka xwediye kesrewanê

Rêşiyê şarê berdanê

Hewar lê lê baranê

H E V A L T İ

Rojekê ez çûm gundekî cem hevalekî xwe. Piştî me şîv xwar, me berê xwe da oda gund. Lewra sohbet û şevbuhurka gund li wêderê bu.

Her kes çi di tûrikê wî de heba derdixist, dema wezna wê dihat.

Sohbet li ser gelek meselên cûre bi cûre domdikir. Di zîzbûna şevê de dor hatibu ser dostanî û hevalti ye.



Gelekan ji civatêni li ser wê meselên sekinin û sohbet germ kirin. Gelek serpêhatiyêni hêja dihate gotin. Bê gûman ne hesan e, ku ez wana gişa kanibim pêşkêşî we bikim. Li dinavan wanade ez dixwazim serpêhatî ya apê Hecî Dawo ji were bêjim.

Dema dor hat ser Hecî Dawo, wî jî li gorî zane-bûna xwe li ser vê meselê hinek tiştên gelenperî got û dû re dest bi serpêhatîya xwe û Şex Husêñ kir:

- Ez û Şêx Husêñ ji zarokî de hevalên hev bûn û em bi hevdûre mezin bûbûn. Malbata Şêx Husêñ di dema xelayê de koçî cem me kiribûn. Demek dirêj ew li cem me man û bavê wî bi melêvayî ji xwe re cot dikir. Ez û lawê wan Şêx Husêñ jî gelek caran bi hevdûre diçûn ber berxa. Dema ku em vala bûna, em dihatin nav gund û wek zarokên din ê gundiyan me bi hevdûre dilîst.

Em ewqa hogirî hevdu bûbûn, ku êdî bê hev sebra me ne dihat. Piştî çend salan, malbata Şêx Husêñ vegerifîyan gundê xwe.

Koç kirina malbata Şex Husêñ bi me gişa ne xweş dihat, lê bi taybetî ji bo min û Şêx Husêñ gelekî zortir bu. Me zanibu ku emê gelekî bêrîya hevdu bikin. Lê mixabin tiştek ji destê me ne dihat.

Hêviya me mabû, ku firset çê bibe da ku em kanibin hevdû bibînin û hesret û bêrîkirina xwe dîsa rê hevdû bidin.

Demek didêj derbas bu, lê belê min û Şêx Husêñ firset ne dît, da ku em hevdu bibînin.

Rojekê diyami ji mir go:

- Layê min, tûtuna me ne maye û hîn gelek wext heye ji civanê me û tûtun anêñ me re. Ewê gelek baş be, ku tu here mala bavê Şêx Husêñ, ji bo ku hinek tûtun ji me re bikiri.

Tûtuna wêdere ji gelek bi nav û denge.
EZ geleki kêf xweş bûm bi wê xeberê. Ji kirîna
tûtun e bêtir mi dixwest ez Şex Husên bivinim.
Mi hespa xwe hazir kir û ez ketim rê.



Navbêna gundê me û gundê mala Şêx Husên du
roj dikşand. Pîstî çend qonaxa ez gîhaşim mala
Şêx Husên. Mi sedema hatina xwe ji wan re got.

Tûtun ji min re kirîn û hinek benî, bastêq û
gûz ji min re hazir kirin.



Dema ezê vegerim malê,dîya Şêx Husêن ji Şêx Husêن re got:

-Lawê min,bi Dawo re here heta tu wî ji nav gund derxîn e. Ji ber ku zarokêñ gund gelekî şû-min û Dawo nas na kin.

Ez li hespa xwe suwar bûm û Şêx Husêن ji da tengalan mi. Em hinekî ji nav mala derketin û gihiştin bênderêñ gund. Li dews bênderan zaroka bi xara dilîstin. Dema em di ber wan re derbas-bûn,hineka ji wan em dîtin û yekî ji nav wan got:

-Lawo,wa yekî ereb !

Sedema ku ez wek yekî ereb dîtim ev bu,ku kî-rasek li min bu û çevî û egalek li serê min bu. Ji ber ku,li der dora me bi piranî em bi vî qiyafetî di gerîyan.

Ewilî Şêx Husêن xwest mi bi parêze û got :

-Lawo,ew mîvanê me ye !

Lê mi li rewşa zarokan û Şêx Husêن mîzekir,ku rewş ne pir xweş e. A rastî mi ne dixwest Şêx Husêن û zarokêñ gund ji bo min bi hev kevin. Ji bo wê yekê mi rişma hespa xwe berda û zeng da hespê. Hesp bi lez ji zarokan dûr ket. Wextê mi li paş xwe nerî,da ku bibînim bê çi bû. Ez çi bibînim ! Gi Şêx Husêن da yi pêşîya zarokan û çawa bi kevira tê ne mi...!

PİRO

KURDISTANA KURDAN

Kurdistana xoşf
Ma kî te difroşî
Pir şerîn û rindî
Tev bajar û gundî
Kurdistan, kurdistan
kurdistana kurdan
Eger wisa mest bî
Tim jar û bindest bî
Her tê hin û hin bî
Bindestê dijmin bî
Kurdistan, kurdistan
Kurdistana kurdan
Kurên te tim razin
Doza te nexwazin
Her çiqasî bakin
Rêça te nas nakin
Kurdistan, kurdistan
Kurdistana kurdan
Divê tev birabin
Weke mera rabin
Destê hevdî bigrin
Bi merañî bimrin
Kurdistan kurdistan
Kurdistana kurdan
Em hasitixwazin
Şev û ro ranazin
Dijminê koledar
Biji Pirolêtar
Kurdistan kurdistan
Kurdistana kurdan

CEGERXWİN

MAMO

Allegro

The musical score consists of two staves of music. The first staff begins with a forte dynamic and includes lyrics: "Ma - mir, Ma - mir. Ma - mir, lo, Ma - mo," followed by a repeat sign and "Ma - mir, Ma - mir, Ma - mir, piz - ma - mo." The second staff continues the melody with a different set of lyrics: "Ma - mir, Ma - mir, Ma - mir, piz - ma - mo." The music features eighth-note patterns and grace notes.

Mamir, Mamir, Mamir, lo, Mamo,
Mamir, Mamir, Mamir, pizmamo.

Ava ji gêdûkê, lo, Mamo,
Ava ji gêdûkê, pizmamo.

Ava ji ç'iyê tê, lo, Mamo,
Ava ji ç'iyê tê, kuřmalo,

Hêlûna ser ç'ûkê, lo, Mamo,
Hêlûna ser ç'ûkê, kuřmalo.

Nav gul û nêrgiza tê, lo, Mamo,
Nav gul û nêrgiza tê, pizmamo,

Jê tê bîna bûkê, lo, Mamo,
Jê tê bîna bûkê, pizmamo.

Bîna yara jê tê, lo, Mamo,
Bîna yara jê tê, kuřmalo.

Xelqê yara te bir, lo, Mamo,
Xelqê yara te bir, pizmamo.

Xelqê xasînga te bir, lo, Mamo,
Xelqê xasînga te bir, kuřmalo.

GELO HÜN ZANİN, MA HEYWAN ÇİLO RADİZƏN?

Razana heywanan ne wek heve. Mesela, mişkê çiyê 6 meha radizê. Lê belê, çilek û pez rojê hew çend deqa radizên.

Legleg û çûkê flamingo li ser nigekî radizen. Kirojkê bejî jî, hew çend deqa radize û ew li cê girtî ranazê. Gava ku ewê razê, dikevi koncalên şûva û li himberî dujminê xwe gelekî şîyarın.

Fîl rojê hew 2 seeta û zurefa jî 3 seeta radizên. Li Afrîqa zurefak heye, navê wi Okapî ye û ji ber ku ji pilingan ditirsi, şevê hew qederê 6 deqa radizê.

Bi navê Mişkê Etrus mişkek heye, ji ber sedemek din, ew jî rojê çend deqan radizê. Lewra pêwîste, ku ew herdem tişkî buxwe. Ger ew 5 deqan di xewde bimîni, kani bibi sebebê mirina wî.

Pelçimok jî, ser berjêr radizê. Masi jî, tev ku çavê xwe nagri jî, mecbûrin razên.

Hinek meymûn, rûdinên û radizên. Gorîl jî, ji bo razê, her şev helîna xwe li ser darekê çêdiki.





PÎREK BİN AVÊ HEYE, 3 METRE YE.

Ev pîrê, kani 50 salî bijî. Di nav heywanên bi qalik, a herî mezin tê qebûl kirin. Li derdor sînorêñ Japonya ye di derya îzû de dijî. Ew pir hindik tê dîtin û 365 metra di bin avê de dijî. Pîra mî, tev ku 1,5 milyon hêk kani biki, lê gelek hindik çêlik ji wán di filitin. Pîrê, di dev salan kamil dibin û 50 salî zêdetir dijin.


Ev pîrê, bi masîyan û heywanên bê qalik xwe xwedî diki.

M İ J Ü L İ

ŞEYTANOKEK HEYE, Dİ BİNE
BİREKÊ DEYE. BİR 12 MET-
RA KURI. ŞEYTANOKA REBEN
Bİ BİRÊ RADİPELİKE, DA KU
DERKEVİ SER RU ERDE.
ŞEYTANOK, HER ROJ 4 METRA
HİLDİKŞİ JOR, LÊ BELE Bİ
SEV 3 METRA DİŞEMİTİ JER.
GELO ŞEYTANOKA REBEN Dİ
ÇEND ROJADE DERDİKEVİ
SER RU ERLÊ ?




M I J U L I ↑




Ji D yê destpê biki û bi dirênceka rapeliki,
bê tu kani bigêji A yê ?

M I J Û L Î




Gelo, kîja taya dighêji guloka dezî ?



Di nav wan kûpana de du heb wek hevin.

Gelo, kîjanani ?

HAÇEPIRS



-5-


KEREKÎ ME HEBÛ Ô KUNDURKÎ ME

KERÊ ME KUNDURÊ ME KOT KOT KOT,

ME JÎ ÇIROK Ô MESELÊN XWE

YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERÊ GOT

KULILK



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANË

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA